Stiranek Rûdanek



Berhevkirin: Dr. Selah Hirorî

Hêriş Li Ser Bingehê leşkerê yê Birîtanî Li Siwaretûka

Piştî rûdana geliyê Mizîrka bi dûmahî hatî rûdanek di navbera hêza hozên kurdî û leşkerê Birîtaniya de peyda bû, ew jî li devera siwaretûka bû demê hêza kurdî li 22 tebaxa sala 1919 hêriş kiriye bingehê leşkerê Birîtanî li siwaretûka, jêderên dîrokî wesa diyar dikin ku berî hêza kurdî hêrişê bike bingehê leşkerê Birîtanî nexşeyek hatibû danan li gundê (seydava) û ev nexşe ji layê Sadiqê Birûyî û Tahir Axayê Hemzanî û Heso Dînoyî hatibû danan û li roja 22 tebaxê hêrişek mezin kire bingehê leşkerê Birîtanî li siwaretûka û şer heta piştî êvarê berdewam bû û çend şervan ji kurdan hatine kuştin 20 ji wan birîndar bûbûn û ji wan Heso Dîno bû, dîsan gelek ji leşkerê Birîtanî jî hatibûn kuştin û li roja duyê firokên Birîtanî dest bi topbarankirina gundên deverê kir.

Vê rûdanê cihê xwe di nav stirana kurdî de kiriye û di vê stirana xwarê de behsê hatina leşkerê ingilîzî dike heta hatiye deverê û behsê Xelîl Paşayî jî hatiye kirin ku serkirdeyê Osmanî bû li devera kurdî ku di stiranê de daxwaz jê dike careka dî bizivire şerî, anku daxwaziya leşkerê Turkî dike harîkariyê bike. Li vê derê wesa dihête diyar kirin ku hindek ji kurdan û ji ber egerê ayinî diviya dewleta Osmanî careka dî bihête Kurdistanê û harîkariya kurdan bike, herçende Osmanî li Kurdistanê tûşî şikestinê bûn, dîsa propaganda Osmanî jî rolê xwe di nav kurdan de hêşta hebû.

Navên serokêlên pişikdar di vê stiranê de nehatine tenê navê Sadiq Birahîm û Tahir Hemzanî hatiye, dîsan cihê şer jî lê hatiye kirin ku siwarêtûka ye. Û li dûmahî behsê girtina şêx Bihaeldîn î dike herçende Şêx Bihaeldîn berî vî şerî hatibû girtin belê girtina şêxî kartêkirin li ser stiranbêjî kiriye ku wî babetî girê dide bi stirana xwe ve û stiran bi dirêjî dibêje:

STIRÂNA ŞERÊ SIWARETÛKA

De nahê de nahê û de nahê
Weylê kesek nîne cewabekê bibite Xelîl Begê bejinzirav
Weylê qumandarî min xayîn topa mezin weylê li pê me nahê.
Esker lundirê weylê xudê xirab biket mala Seîd Talib paşayê Bexda yê
Ewî berda bû bû xazî behrû
Weylî sê şev û sê roja şer ketibû ser behrû
Eskerê îngilîzî daxil bû Bexdayê
Weylê deylê de nahê axawo de nahê
Weylê kesek nîne cewabekê bibite Xelîl begê bejinzirav
Weylê qumandarê min yê xayîn topa mezin me nahê
Ezê bi siwaratûka xopan bêjim wa bi bere
Weylê eskerê îngilîzî bi top û reşaş cebilxayîne ve weylê hate ser me.
Weylê aferîn sed aferîn ji bo Tahir Paşa di gel Sadiq Biroyî
Weylê bi qefta xencera ho dane ser çepera
Weylê de nahê axwo û de nahê
Weylê kesek nîne cewabekê bibite Xelîl Begê bejinzirav
Weylê qumandarê min ê xayîn topa mezin pê me nahê.
Ezê bi siwaretûka xopan bêjim wa bi kaşe
Li min xweş tê dengê kiçik caba nahê
Welê babo dengê revê Qahîd Paşa weylê aferîn sed aferîn ji bo Sadiq Biro digel Tahir Paşa
Weylê de nahê axwo de nahê
Kesek nîne cewabekê bibite Xelîl Begê bejinzirav
Weylê qumandarê min ê xayîn topa mezin pê me nahê
Weylê ezê Bamerna xopan bêjim wa li devê velî
Weylê heyfê ji wê heyfê teyarêt îngilîzî li ser bûne xêlî
Weylê Tahir Paşa bi sê denga dikete gazî
Sadiq Biro destêt xwe hilîne evro roja mêrane
Weylê heyf û sed mixabin destêt Şêx Bihaeldînî bikene darê kelamçê de bibine Mûsila şewitî
Bikene ber emelî
Weylê de nahê axawo de nahê
Kesek nîne cewabekê bibite Xelîl Begê bejinzirav
Weylê qumandarê min ê xayîn topa mezin pê me nahê.*

Sebaret vê hêrişê binêre van jêderan:
-Wîlson: Bilad ma bîn el nihrîn bîn wilaîn xwatir şixsiye û tarîxiye, tircime:Fuad Cimîl, teqdîm û miracee Dr. Ela Nûris, Bexdad-1992,c.3, R47
Ebdalnihim El Filamî: surtina fî şsl el Iraq, 1919-1920, Bexdad-1966, c1,R.55-56.
**Ji destnivîsa Tahir Mihemed Duhokî hatiye wergirtin û ev destnivîse li pertukxayîna melbendî li zankoya Duhokê parastiye.*